## BERXWEDANA LI DIJÎ TECRÎDÊ DEWAM DIKE



# Çalakgeran dest bi kampanyayê kir

**ÇALAKIYA** greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger a hevseroka KCD'ê Leyla Guven ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daye destpêkirin, di roja 44'emîn de didome.


**DI 16'Ê KANÛNÊ DE** li 8 girtîgehan 36 girtiyan dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger kiribû. Navên kesên ku tev li çalakiyê bûne, diyar bûn. Li aliyê din li grevên dorveger jî didomin.

**LI STRASBOÛRGÊ** çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger di roja 5'emîn de dewam dike. Her wiha çalakgeran ji bo ku CPT biçe serdana Ocalan dest bi komkirina îmzeyan kir... RÛPEL - 3

@rojname

21 Kanûn - În 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 211

## Proseseke nû dest pê dike



Trump der barê vekişîna ji Sûriyeyê de yek du tweet weşandin. Piştre peyamên bi nakok ên rayedarên amerîkî li pey hev hatin dayîn. Helbet ev ne cara yekem e ku Trump behsa vekişîna ji Sûriyeyê dike lê îcar ji bo vekişînê zêde cidî xuya dike. Tişta ku ez di dawiyê de bibêjim hema niha bibêjim; Amerîka bi pêyên xwe ji herêmê derkeve jî destê xwe ji herêmê venakişîne... *Nivîsa Ramazan Olçen* / R.4

# SERKEFTIN HER A KURDAN E

## TEV-DEM'ê diyar kir ger li dijî Rojava êrîş pêk werin dê gel li ber xwe bide. Nivîskar Ahmet Aktaş jî got serkeftin her a me ye û şikestin para neyaran e



### VEKIŞÎN DI ROJEVA CÎHANÊ DE YE


Biryara Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ya vekişîna ji bakurê Sûriyeyê di rojeva cîhanê de ye. Têkildarî mijarê gelek dewletan nerazîbûn nîşan dan û Tirkiye jî gefên dagirkeriyê didomîne. Nivîskarê rojnameya me Ahmet Aktaş têkildarî vê mijarê nivîsand û wiha got: "Ger em li ser şopa heqîqeta felsefeya Rêberê xwe, hîn bi xurtî û rêxistinî bimeşin û li ber xwe bidin, serkeftin her a me ye, şikestin a neyarên me ye."

### LI ROJAVA SERHILDANA GEL

Gelê rojavayê Kurdistanê û bakurê Sûriyeyê li dijî gefên Tirkiyeyê rabûn ser pêya û bi beşdariya sed hezaran meş û çalakî li dar xistin. HSD'ê diyar kir ku biryara DYA'yê dê bi xwe re pêşerojek metirsîdar bîne. Berpirsê Komîteya Têkiliyên Doplomasiyê ya TEV-DEM'ê Aldar Xelîl da zanîn ku wan tu carî hêviyên xwe yên serkeftina şoreşa li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nespartine hêzên derve... RÛPEL - 3


### *KNK: Divê qada hewayî were qedexekirin*

KNK'ê têkildarî biryara vekişîna DYA'yê ya ji Sûriyeyê, bi ser navê 'Banga Lezgîn' daxuyaniyek da. KNK'ê bang li Konseya Ewlekariyê ya NY'ê kir û xwest ku Bakurê Sûriyeyê li firîna balafiran qedexe bike. Her wiha KNK'ê xwest ku gelên cîhanê li hemberî êrîşan piştgiriya gelê herêmê bikin... RÛPEL - 3



### *HDP: Bila hemû hêzên derve ji Sûriyeyê vekişin*

Hevserokê HDP'ê Sezaî Temellî, di çarçoveya serdana xwe ya bakurê Kurdistanê de, navenda partiya xwe ya Amedê ziyaret kir. Temellî, biryara DYA ya vekişandina ji Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nirxand û got: "Divê hemû hêzên derveyî welat ji Sûriyeyê vekişin. Em bang li NY'ê dikin ku însiyatîfê bigire."... RÛPEL - 3




## Jineolojî dîrok û xwezaya jinê ye



Ji bo danasîna zanista jineolojiyê li Şehbayê perwerde ji bo endamên Kongreya Star, Dada Civakî,Yekitiya Êzidiyan, Jinên Ciwan, Desteya Aborî û Meclisa Sûriyeya Demokratîk hat dayîn. Jinên ku beşdarî perwerdeyê bûn gotin ku jineolojî dîrok û xwezaya jinê şîrove dike. Hat gotin ku jin ji bo mafên xwe bêpar nemînin divê têkoşîna xwe mezintir bikin... R.2

## Di qada hunerê de jinên kurd



Di dirêjahiya sedan salan de jinên kurd jî di gelek warên siyasî, civakî, aborî û hunerî de mil bi milê mêran xwedî liv û lebateke bêrwasetan bûne. Li jêr ez tenê bi kurtî behsa jiyan, wêrekî û xebata çend jinên hunermend ên li Kurdistana mezin dikim ku heya roja îro jî ji nifşên pey xwe re bûne xwendingehên hunerî... *Nivîsa Kakşar Oremar* / R.6

## Qayûm çina bo rektor zî oyo



Serekê Pêroyê yê AKPyî Tayyîp Erdogan weçînayîşê herêmî ra ver Ahmet Çamsari kerd rektorê Unîversîteya Mêrsînî. Derheqê babete de akademîsyen Atîlla Guneyo ke bi Qerarnameyê Hukmê Qanûnî (KHK) amebî îxraçkerdiş û Hetgira Doçent Esra Erguzelogluya ke Unîversîteya Mêrsînî ra ameybî îxraçkerdiş qisey kerdî... RÛPEL - 5



## Ji partiyên kurd banga yekitiyê

Li Qamişloyê 9 partiyên siyasî yên kurd têkildarî gefên Tirkiyeyê yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê banga yekitiya neteweyî kirin. Di daxuyaniyê de hat gotin ku gefên dewleta tirk li hemberî hebûna kurdan e.

## Hêriş dewamê serranê 90an o



Tirkiye 13ê kanûne de kampa Şehîd Rustem Cûdîyî ya Mexmûrî ke binê pawitişê Neteweyê Yewbîyayeyî (NY) de ya bombardûman kerdbî... R.5

## Sebebê nê teşxelyan dagirker ê



Ma baş zanê eyro roc sebebê teşxeleyan Emerîka, Rûsya, Îran, Ewropa û Tirkiye bi xo yê. Xo ra awankarê DAÎŞ'î bi xo zî ey bi xo yê... *Nûşteya Nesrîn Navdar* / R.5

www.arsivakurdi.org




## Nivîskar Nermîn Osman pirtûkên xwe belav kirin

**SILÊMANÎ -** Nivîskar Nermîn Osman li bajarê Silêmaniyê bi merasîmekê 3 pirtûkên xwe belav kirin. Yek ji pirtûkên Nermîn Osman ya bi navê 'Pirtûka Zarokan û Perwerdeyê' ye. Di pirtûkê de gelek çîrok hatine nivîsandin. Dê pirtûka nivîskar di refên pirtûkxaneyên dibistanan de jî werin bicihkirin. Nermîn Osman di sala 1951'an de li bajarê Koyê ji dayik bûye. Osman piştî zanîngehê bûye endama Komeleya Rêncberên Kurdistanê. Di sala 1971'î de bû endama Rêveberiya YNK'ê ya Jinên Kurdistanê û di 1979'an de jî bûye pêşmerge. Osman ku di nav Hikûmeta Herêma Kurdistanê de gelek erk wergirtine, di hikûmeta dema Nurî Malikî de jî bûye Wezîra Kar û Barên Jinan.

# Di salekê de 7 hezar jin tev li xebatan bûn

Jinên ku di qadên birêxistinkirina jinan de dixebitin anîn ziman ku di salekê de 7 hezar jin tev li xebatan bûne. Ji endama Rêveberiya Aboriya Jinê ya Herêma Cizîrê Şêrîn Emîn û endama Buroya Têkildarî Dîplomasiyê ya Kongreya Starê Feryal Hesen da zanîn ku bi kar û xebatên xwe jinan tev li xebatan kirin û têkiliyên di navbera jinan de xurt kirine

Endama Rêveberiya Aboriya Jinê ya Herêma Cizîrê Şêrîn Emîn û Endama Buroya Têkiliyên Diplomasiyê ya Kongreya Starê Feryal Hesen xebatên der barê aboriya jinê yên salane de nirxandin û gotin ku ji bo hemû jinan qadên xebatan hatin avakirin.



Şêrîn Emîn da zanîn ku aboriya jinê li ser asta Herêma Cizîrê kanton hatin rêxistinkirin û wiha got: "Di çarçoveya rêxstinkirina Kantona Qamişlo û Hesekê de, endamên navçe û bajarokan Yekitiya Kooperatîfan ava kirin û xebatên xwe dan meşandin. Navendên Aboriya Jinê li tevahî bajarên bakurê Sûriyeyê hatin birêxistinkirin."

**Xebatên aboriyê dê bidomin**

Emîn di axaftina xwe de bal kişand ser hejmara jinên ku dixebatin û aboriya xwe pêş dixin, ev tişt anî ziman: "Di vê salê de 7 hezar jin xebitîn. Her wiha di aliyê çandiniyê de jî 61 hezar donim di destê jinan de ye, ew jî bi rengê kooperatîf xebatê didin meşandin. Di aliyê bazirganiyê de pêngaveke xurt dan destpêkirin. Bi vekirina Sûka Jinê li Dêrikê xebat pêş ket û her wiha niha amadekariya Sûka Jinê li navçeya Amûdê tê kirin. Di sala 2018'an de gelek endam û qad hatin bi rêxistinkirin, jinên ji pêkhateyên cuda tev li xebatên aboriya jinê bûn. Ji aliyê jinên ereb ve tevlêbûnek xurt çêbû. Di sala nû de ji bo herêmên ku nû hatine rizgarkirin em ê xebatên aboriya jinê li wir mezintir bikin. Her wiha sererastkirin û nûvekirina kooperatîfan li gorî rêziknameya aboriya jinê dê bidomin ."

**Têkiliyên jinan hatin xurtkirin**

Endama Rêveberiya Buroya Têkiliyên Diplomasiyê ya Kongreya Star Feryal Hesen jî di der barê xebatên xwe yên li herêma Cizîrê de ev tişt vegot: "Me kar û xebatên cuda kirin. Kongre û konferansên li hundur û derve hatin çêkirin. Me li ser esasên Neteweya Demokratîk xwe birêxistin kir. Me têkiliyên xurt di nav jinên kurd, ereb, suryan, ermen û tirkmenan de ava kirin. Dema ku têkiliyên jinan xurt dibin pêşketin zêdetir dibe. Me pêngava 'Jin ji bo Efrînê rabin ser pêyan' dest pê kir. Ji ber ku jinên Rojava li her qadê xwe pêş dixin loma çavên cîhanê li ser wan e. Me meşa jinên cîhanî jî li dar xist û ev meş deng veda. Em beşdarî xebatên li ser çar parçeyên Kurdistanê û Ewropayê bûn."



**Gelek semîner pêk hatin**

Her wiha Hesen destnîşan kir ku li seranserê rojavayê Kurdistanê bi taybetî li herêmên ku nû hatine rizgarkirin Tebqa, Reqqa, Dêrazor û Minbicê li ser azadiya jinê, neteweya demokratîk û 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinan a Cîhanê semîner hatin dayîn û got ku kar û xebatên wan ên ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û rizgarkirina Efrînê dê di sala nû de jî bidomin. ***QAMIŞLO***

## Divê jin ji xebatê netirsin

Xebatkarên jin ên li Taxa Cûdî ya Qamişloyê der barê xebata jinê ya di nav civakê de axivîn û diyar kirin ku dema jin bixebite dikare xwe pêş bixe.



Jina bi navê Meyîhan Ehmed anî ziman ev çar sal in ku ew di firinê de dixebite û wiha got: "Ez û hevjînê xwe bi hev re karê firinê dikin. Dema ku ez nexebitim ez dibêjim qey tiştek ji jiyana min kêm dibe. Ez ji xebatê gelek hez dikim. Ji ber ku xebat mirovan pêş dixe ez pêşniyar dikim ku hemû jin bixebitin."



Jina bi navê Fatima Ehmed ku ew jî karê dirûtinê dike ev tişt anî ziman: "Ev 10 sal in ez karê dirûtinê dikim. Cilên cuda ji jinan re didirûm. Jinên tên gel min ji karê min pir bi kêfxweş in. Ez bi keda destên xwe debara xwe dikim loma xwe gelek bextewar hîs dikim. Loma ez dixwazim hemû jin bixebitin û li destên mêra mêze nekin. Jin dikarin her karî bikin. Divê tenê jin ji xwe bawer bin û hewl bidin. Ji bo keda jinê neyê binaxkirin divê jin bi hev re tev bigerin û ji xebatê netirsin." ***QAMIŞLO***

## Heta rakirina tecrîdê dê li ser pêyan bin



Hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ev 44 roj in di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Li gelek cihan jî ji bo piştgiriya Guven û şikandina tecrîdê çalakî tên lidarxstin.

Jinên Efrînê yên ku li kantona Şehbayê bi cih bûne jî piştigiriyê dan çalakiya Guven.

Jina bi navê Fîdan Dawid diyar kir ku Guvewn jineke jêhatî ye, ew ji bo gelê bindest azadiyê dixwaze û wiha got: "Lê dewleta tirk a faşîst her dem li dijî demokrasiyê tevdigere. Loma gelek jinên wekî Leyla îro di nav çar dîwaran de ne. Leylayê fikir û felsefeya Rêber Apo diparêze û ji bo wî ketiye greva birçîbûnê. Em ê heta dawiyê piştgiriyê bidin Leylayê. Heta Rêber Apo azad nebe em dev ji çalakiyan bernadin."

**Dê tecrîd vala derkeve**

Semîra Muhemmed Hemze jî ev tişt anî ziman: "Rast e ku îro Rêber Abdullah Ocalan di zindana Îmraliyê de ye lê bi hezaran jin ji bo azadiya Rêber Apo li ser pêya ne. Mînaka niha jî Leyla Guven e. Ev çalakiya Leylayê ji bo me xwedî wateyek mezin e. Em ê her ji bo vê dozê li ser pêya bin."

Her wiha Emîra Muhemed jî da zanîn ku dewleta tirk bi hemû hêza xwe hewl dide têkiliya di navbera jin û Ocalan qut bike û wiha axivî: "Lê ev hewldan wê vala derkeve. Ji ber ku ji bo azadiya Rêber Apo bi milyonan jin li ser pêyan e û heta ku tecrîd jî bidawî bibe em ê li ser pêyan bin." ***ŞEHBA***

## Jineolojî dîrok û xwezaya jinê şîrove dike

Ji bo danasîna zanista jineolojiyê li Şehbayê perwerde ji bo endamên Kongreya Star, Dada Civakî,Yekitiya Êzidiyan, Jinên Ciwan, Desteya Aborî û Meclisa Sûriyeya Demokratîk hat dayîn. Jinên ku beşdarî perwerdeyê bûn gotin ku jineolojî dîrok û xwezaya jinê şîrove dike.

Seroka Desteya Jinê Zelox Reşîd diyar kir ku dema jin beşdarî perwerdeyê dibin û lêkolîn dikin digihîjin asteke bilind û got ku ji bo jin ji mafên xwe bêpar nemînin û têkoşîna xwe mezintir bikin pêdivî ji zanista jineolojiyê heye.

**Serkeftin bi jineolojiyê pêkan e**

Endama Komîteya Jinê ya Meclisa Herêma Efrînê Sûreya Mustefa anî ziman ku ji dîrokê heta niha jin ji bo parastina destkeftiyên xwe têdikoşin û wiha got: "Perwerdeya jineolojî ji bo pêşketina jinan gelek baş e ji ber vê divê hemû jin beşdarî perwerdeya jineolojiyê bibin."

Her wiha hevseroka Meclisa Herêma Efrînê Şêrîn Hesen jî ev tişt anî ziman: "Niha em bi zanista jineolojiyê têkoşîna li dijî feraseta serdest a mêr didin. Ji bo jin dîroka xwe nas bike divê xwe bi rêxistin bike. Ev yek jî bi saya zanista jineolojiyê pêkan e."***ŞEHBA***



## 5 meh in li dijî JES'ê têdikoşin




Li Kizilcakoy a navçeya Efeler a Aydinê, Şîrketa Enerjiyê ya Gurmatê dixwaze Santrala Enerjiyê ya Jeotermalê (JES) çêbike. Şêniyên gund ji bo JES neyê çêkirin 5 meh in nobetê digirtin.

Di 6'ê kanûnê de derdora erdê ku tê xwestin JES lê bê çêkirin, bi têlanê hat girtin û darên li derdorê hatin rakirin. Li ser vê şêniyên gund bertek nîşan dan û di mudaxilekirina cendirmeyan de 3 jin hatibûn derbkirin. Çalakiya nobetê ya şêniyên gund didome.

**Dê çalakî bidome**

Der barê mijarê de jinên ku ketine çalakiyê axivîn û diyar kirin ku heta JES ji vir neçe dê ew jî neçin û destnîşan kir ku bi tu awayî nahêlin bîrek jî bê kolandin. Her wiha jinan got heta ku ew bigihîjin armanca xwe dê çalakiyên xwe bidomînin. ***AYDIN***

## Bi hewldanên xwe Mala Şînê çêkirin

Li navçeya Ebex a Wanê piştî ku qeyûm tayînî şaredariya DBP'ê bû hemû projeyên ji bo gundan hatibûn amadekirin nîvco man. Lê jinan hewcedariyên xwe bi awayekî komunal pêk anîn. Jinên gundê li Sagmali ya Jorîn bi hewldanên xwe Mala Şînê çêkirin.

Jina bi navê Soylemez Çîçekçî da xuyakirin ku li gund ji bo hewcedariyên din ên jinan xebat meşandine û wiha got: "Li gundê me gelek kêmasî hene. Projeyên me piştî qeyûm nîvco man. Ji ber vê me jinan mala şînê bi hevkariyê çêkir. Me kevirên mala ku hilweşyabû da alî û me mala şînê ava kir. Ev du meh in çêkirina wê didome. Me kevir bi hev re dan alî û beton amade kir. Me firçe, boyax û alavên înşaatê bi jinan re stand. Lê sîwana wê mêran çêkir. Her jinekê jî tiştek anî. Yekê sobe, yekê xalî anî. Wek jin em ê hîn gelek tiştan li gund çêbikin." ***WAN***



## WOLA rapora xwe ya salane aşkera kir

Li bajarê Helebçeyê Rêxistina Alîkariya Zagonyî ya Jinan (WOLA) rapora xwe ya salane ya taybet a têkildarî astengiyên li pêşiya pêkanîna zagonya têkoşîna li dijî tundiya di nav malbatê de aşkera kir.

Di raporê de sedem û ziyanên astengiyên li pêşiya pêkneanîna zagonya têkoşîna li hemberî tundiya di nav malbatê de hat diyarkirin ku ev zagon di sala 2011'an de li parlamentoya Herêma Kurdistanê hatiye derxistin.

**Nebûna zagonan pirsgirêk e**

Li gorî raporê li Helebçeyê zagona têkoşîna li dijî tundiya di nav malbatê de pêk nayê û wiha hat gotin: "Nebûna dadgehek taybet ji bo astengkirin tundiya di nav malbatan de, nebûna polîsên jin di nava rêveberiya polîsên Helebçe de şîdetê zêde dike. Li gorî xala 6'an a maddeya 3'yan pêwîst e hinek polîsên jin jî hebin. Li Helebçeyê nebûna cihekî parastinê ji bo wan jinên ku tundî li wan tê kirin ji bo jinan dibe pirsgirêk." ***HELEBÇE***

www.arsivakurdi.org

# Gel tu car xwe nespart hêzên derve

Aldar Xelîl da zanîn ku wan tu caran xwe nespartiye hêzeke derve û hemû destkeftiyên xwe di encama berdêlên mezin de bi dest xistine. Xelîl da zanîn ku gelên bakur û rojhilatê Sûriyeyê xwe birêxistin bike û yekitiya xwe ava bikin, dikarin gefên dewleta tirk bişikînin



Berpirsê Komîteya Têkiliyên Diplomasî ya TEV-DEM'ê Aldar Xelîl têkildarî biryara DYA'yê ya ji bo vekişîna ji Sûriyeyê axivî. Xelîl da zanîn ku wan tu carî hêviyên xwe yên serkeftina şoreşa li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nespartine hêzên derve.

Aldar Xelîl da zanîn ku di pêvajoyeke hesas re derbas dibin û ev nirxandin kir: "Ev demeke Erdogan gefan li tecrûbeya Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dixwe. Beriya niha destek da DAIŞ'ê. Êrîşî Efrînê kir û ji bo têkbirina şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hemû rêbazên siyasî û diplomasî bi kar anîn. Erdogan niha careke din gefan dixwe. Bi gefên xwe re dixwaze destkeftiyên gelê herêmê têk bibe. Li hemberî van gefan, gelên herêmê jî amade ne ku destkeftiyên xwe biparêzin."

Xelîl destnîşan kir ku wan tu caran xwe nespartine hêzên derve û wiha pêde çû: "Şoreşa me bi hêza xwe ya cewherî û hevgirtina gelên herêmê heta niha dom kir. Dem û çawaniya vekişandina DYA'yê ne diyar e. Ger ku hêzên derve bimînin dibe ku em ji mayîna wan sûd wergirtin lê ger biçin jî ya herî girîng, berxwedana gelê me ye. Ji bo bidawîkirina gefên dewlet tirk, pêwîstî heye ku zext li ser civaka sivîl a navdewletî bê kirin. Ger ku hemû pêkhate û saziyên sivîl ên demokratîk, bi awayeke demokratîk daket qadan dê rê li ber êrîşan bê girtin." *QAMIŞLO*

## Ji saziyan banga xwedîderketinê

**Gelek sazî û rêxistinên kurd û kurdistanî derbarê biryara vekişîna Amerîkayê de daxuyanî dan.**

**Konseya Rêveber a Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) li ser biryara vekişîna DYA'yê ya ji Sûriyeyê, bi ser navê 'Banga lezgîn' daxuyaniyek da. KNK'ê bang li Konseya Ewlekariyê ya NY'ê kir û xwest ku Bakurê Sûriyeyê li firîna balafiran qedexe bike. Her wiha KNK'ê bang li welatên Ewropayê, gelê cîhanê û derdorê demokrat jî kir ku li hemberî êrîşan piştgiriya gelê herêmê bikin.**

**Hevserokatiya Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) têkildarî gefên dewleta tirk û biryara Amerîkayê daxuyaniyeke nivîskî weşand. TEV-DEM'ê da zanîn ku dewleta tirk tehemûla têkçûna DAŞÎ'ê nake û ji ber vê jî gefan li Bakurê Sûriyeyê dixwe û diyar kir ku rayedarên DYA'yê dikarin xwe ji Sûriyeyê vekişînin lê divê ev biryar nebin parçeyek ji planên qirêj ên li ser gelên mezlûm. Di daxuyaniyê de TEV-DEM'ê xwest NY bikeve nav liv û tevgerê û bang li hemû gelên bakurê Sûriyeyê kir kul i dijî dagirkeriyê têkoşînê bilind bikin.**

**Fermandariya Giştî ya Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) jî daxuyaniya xwe de got ku şerê li dijî çeteyên DAIŞ'ê hîn didome, ger hêzên koalîsyonê di vê serdemê de ji herêmê vekişê dê ev yek rê li ber bihêzbûna terorîzmê veke.**

**Her wiha Partiya Jinûveavakirina ya Sosyalîst (SYKP) jî diyar kir ku jî Amerîka heta Rûsyayê, ji Erdogan heta Esad hêzên hevrikên hev destpêkê li Efrînê niha jî li beşê din ên Rojava li hemberî HSD/PYD'ê ku li dijî DAIŞ'ê bi lehengî têdikoşin di heman refê de gihîştine hev û bang li gelê cîhanê kir ku yekane hêza ku dikare pêşî li zilm û bêwijdaniyê bigire xwedîderketina Rojava ye.** *AMED*



## 'Hêza me ya em xwe biparêzin heye'

Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li dijî gefên operasyona li ser herêmê, bêdengiya hêzên navneteweyî û biryara Amerîkayê bi ser baregeha Koalîsyona Navneteweyî ve meş li dar xistin. Ji bajarên bakur û rojhilatê Sûriyeyê bi deh hezaran welatiyên kurd, ereb, ermen û tirkmen li gundê Çelebî yê Kobanê kombûn û ber bi baregeha Koalîsyona Navdewletî ve meşiyan. Girseyê wêneyên kesên di têkoşîna li dijî DAIŞ'ê de şehîd bûna hildan û dirûşmên li dijî DAIŞ'ê, faşîzmê û gefên operasyonê berz kirin. Meş li baregeha koalîsyonê bi dawî bû û rayedarên kurd û ereb daxuyaniya çapemeniyê dan.

Rayedaran diyar kirin ku dê li dijî êrîşên li ser herêmê li ber xwe bidin û wiha bang li DYA û hêzên koalîsyonê kirin: "Hebûna me ne bi we dest pê kir û dê hebûna me jî ne bi we be. Hêza me ya cewherî heye. Hêza ku li dijî terora mezin a cîhanê tune kir, dikare li dijî êrîşên faşîzmê jî bisekine."

**Gelan ji Trump re name şandin**

Piştî axaftinan heyeta ji 7 kesên kurd, ereb, suryan û tirkmen pêk dihat bi rayedarên koalîsyonê re hevdîtin pêk anîn. Daxwaza gelan ji rayedarên koalîsyonê re ragihandin. Di heman demê de heyet ali ser navê gelan hevdîtinê pêk anî nameyek ku daxwaza gel têde hatibû nivîsandin ji bo bigîhinin serokê DYA'yê Donald Trump radestî rayedarên koalîsyonê kirin. *KOBANÊ*

## 'Ne tenê DYA divê Tirkiye jî vekişe'



**Hevserokê HDP'ê Sezaî Temellî di serdana xwe ya HDP'a Amedê de pirsên rojnamegeran bersivandin. Temellî di serî de bal kişand ser greva birçîbûnê ya Leyla Guven û destnîşan kir ku divê daxwaza Guven pêk bê.**

**Temellî da zanîn ku pirsgirêkên tenduristiyê yên Leyla Guven hene û wiha got: "Dema krîtîk dest pê kiriye. Bêyî ku dereng bikevin divê her kes bi erk û berpirsyariya xwe rabe. Ji bo vê jî lazim e tecrîdkirina birêz Ocalan bi dawî bibe. Di vê mijarê de bi lez gav dikare bê avêtin û divê parêzer karibin biçin Îmraliyê."**

***Divê gel biryara pêşeroja xwe bide***

**Têkildarî biryara DYA'yê ya ji vekişîna Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî Temellî wiha got: "Nêrîna me zelal û aşkera ye. Bila hemû hêzên derve ji Sûriyeyê vekişin. Bila DYA jî vekişe, Tirkiye jî Rûsya jî ji Sûriyeyê vekişin. Bi dîtina me divê hemû hêzên derve vekişin, gelên Sûriyeyê li ser pêşeroja xwe biryarê bidin. Ji bo ku dawî li lîstikên şer ên li Sûriyeyê bê anîn divê Neteweyên Yekbûyî (NY) tavilê li hev bicive û ji bo aştiyê helwestekê nîşan bide."** *AMED*

## Ji bo azadiya Ocalan kampanyaya îmzeyan

Ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li bajarê Strasbourgê yê Fransayê ji aliyê 'Însiyatîfa Azadî Ji Ocalan Re' di 17'ê kanûnê de greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger hat destpêkirin û ev 5 roj e didome. Çalakgerên greva birçîbûnê daxwazên xwe kirine dosyeyek û pêşkêşî saziyên Ewropayê kirin. Çalakgeran niha jî ji bo ku CPT biçe serdana Ocalan dest bi kampanyaya îmzeyan kirin.

Ji aliyê din ve çalakiyên greva birçîbûnê ku Kurdistan û derveyê welat jî hatine destpêkirin didomin.

Bi armanca şermezarkirina tecrîdê bi pêşengiya Kongreya Star û PYD'ê li Til Temirê ya kantona Hesekê ji bo du rojan konê çalakiyê hat vedan.

Çalakiya li Silêmaniyê ya di bin pêşengtiya Komeleya Karkerên Mezopotamya de jî di roja 8'emîn de û Hewlêrê ku ji aliyê nûnertiya HDP'ê ve hatiye destpêkirin jî 31 roj e didome.


Her wiha li navçeya Miçûrînskê ya bajarê Tambov ê Rûsyayê, çalakî ket roja 4'emîn. Çalakgeran bang li hêzên navneteweyî kirin ku ji bo rakirina tecrîdê bikevin nav hewldanan. *AMED*




## Navên girtiyên di grevê de ne diyar bûn

Çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger a hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daye destpêkirin, di roja 44'yemîn de didome. Bi heman boneyê 36 girtiyan jî di 16'ê kanûnê de li 8 girtîgehan dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger kiribûn. Navên kesên ku tev li çalakiyê bûne, diyar bûn.

Di vê çarçoveyê de li Girtîgeha Jinan a Gebzeyê girtiyên bi navên Hacer Halîl Yûsûf, Ruhşan Bozan, Ozlem Ozdemîr, Ayten Gulsum û Ozlem Soyler, li Girtîgeha Jimar 1 a Tîpa F ya Kandirayê girtiyên bi navên Îbrahîm Kaya, Umut Çamlibel, Yûsûf Başaran, Guven Suvarîoglu, Ridvan Guven û Necla Atak, li Girtîgeha Tipa L ya Patnosê girtiyên bi navên Mehmet Bozdag, Cengaver Aykul, Atîlla Coşkun Ozer, Omer Kabul û Abdullah Kizilkaya, li Girtîgeha Jimar 1 a Xarpêtê girtiyên bi navên Metîn Serhat, Harun Alkan û Mûsa Candemîr, li Girtîgeha Tîpa D ya Amedê girtiyên bi navên Sercan Gumuş, Ridvan Kaya, Nîmetullah Cînkiliç, Hayatî Uzman û Cuneyt Aslan, li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê girtiyên bi navên Leyla Guven, Evîn Kaya, Kîbriye Evren û Hîlal Olmez, li Girtîgeha Tîpa F ya Wanê Cîhan Tamur, Bariş Kahraman, Şahîn Oncu, Azîm Sokemen û Bahtiyar Kemal Hasan û li Girtîgeha Jinan a Bakirkoyê jî girtiyên bi navên Esma Başkale, Belgîn Kanat, Zozan Kutum û Reyhan Coşmuşlu di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ne. *AMED*



ŞIROVE
Ahmet AKTAŞ
saktas25@hotmail.com



## Vekişandina Trump a ji Sûriyeyê!

Min dest bi nivîsa xwe ya vê hefteyê kiribû û min li ser Recep û 'birayê' wî Omer Beşîrê sûdanî dinivîsî, ji nişka ve nûçeya biryara Trump ket rojevê. Di vê nûçeya lezgîn de, tê gotin ku Amerîka leşkerên xwe ji Suriyeyê vedikişîne.

Li ser vê biryara Trump, bi piralî şîrove tên kirin. Wiha tên gotin:

✓ Trump û Pûtîn, li ser hinek pirsgrêkên global li hev kirine, lewma Sûriyeyê ji Rûsyayê re dihêle.

✓ Berevajiyê vê gumanê Trump, bêyî Rûsyayê, li gel Recep pêk hat; lewma fuzeyên Patrîot dide Tirkiyeyê. Di vê lihevhatinê de mijara herî girîng; bi hev re lêdana Îranê jî heye. Her wiha, bi vê ve girêdayî, Recep li ser Suriyeyê û bi taybetî li ser Rojava azad dike, ji bo ku ew û Rûsya û Îran werin dijberî hev, navbera wan nexweş bibe, şer û pevçûn derkeve.

✓ Dibe ku mijara Omer Beşîr jî bi vê ve girêdayî be. Jixwe tê gotin ku rojekê berê hatiye Recep dîtiye û dûvre derbasî Şamê bûye. Gumana ku Sîsî jî were Şamê û bi vî awayî hevbendiyek nû di navbera dewletên ereb de were avakirin.

Li gel van gumanan gelek dîtinên din ên dijberî hevdu jî tên gotin hene. Mînak, di serî de tê gotin Trump û Pentagon weke hev nafikirin. Îngilistan li dijî vê biryarê derdikeve. Rûsya bi guman lê temaşe dike. Îsraîl dibêje du roj berê em agahdar kiriye.

Li aliyekî din hinek daxuyaniyên balkêş jî hene. Berî vê biryara Trump bi du rojan, wezîrên derve yên Rûsyayê û Îranê û Tirkiyeyê, bi lezgînî çûn Cenevreyê civiyan û bi awayekî serkeftî daxuyanî dan çapemeniyê ku ji bo makezagona Sûriyeya dahatû çêbikin komîsyonek damezrandine!

Berdevkê wezîrê karûbarê derve yê Îranê Behram Qasimî, ragihand ew dewleta ku bêyî destûra dewleta Suriyeyê bikeve xaka wê nayê qebûlkirin! Wezîrê Karên Dervê yê Tirkiyeyê Çavuşoglû, di heman rojê de got ger Beşar Esad were hilbijartin em dikarin li gel rûnin! Li ser banga R.Erdogan, serokê Îranê Rûhanî li Enqereyê ye û dê du rojan mêvanê Recep be!

* * *

Bi qasî tê xuyakirin, ew ê hinek bûyerên girîng biqewim in. Bêguman serkêşê van senaryoyên xwînrij jî dê R.Erdogan be.

Jixwe weke tê dîtin, her roj gef û fortan dixwe û dibêje 'ez ê êrîşî her cihê kurd û kurdistaniyan bikim û ez ê hemû deskeftiyên wan xera bikim, talan bikim û wêran bikim!' û hema li pey van gotinên xwe, êrîşî Mexmûrê û Şengalê kir, 7 welatparêz jî şehîd kir.

Îcar ne dûr e ku Amerîka jî weke Rûsyayê destûrê bide Recep û êrîşkariyêk duyem weke ya Efrînê bîne ser Rojava. Êdî gelek serpêhatiyên me yên reş û nexweş çêbûne. Bêguman divê em jî êdî baştir dersan ji van serpêhatiyên kambax derxin û tedbîrên xwe yên baştir û berfirehtir bistînin.

Weke em her car dibêjin hêvî û hewara me em bi xwe ne. Divê em li her derên ku lê dijîn yekitî û piştgriya xwe bi hevdu re xurttir bikin.

Çalakiyên me yên greva birçîbûne bi berfirehî dewam dikin. Divê em yên li derveyî welat, li dor van çalakiyan, em çalakiyên cur bi cur ên demokratîk û dîplomatîk biafirînin. Bi vê şêwazê em doza xwe ji mirovatiya cîhanê re baştir bidin pênasekirin û li ser cîhanê bi giştî bandora doza xwe bikin.

Her wiha serpêhatiyên me yên baş û xweş û bi rûmet jî gelek in. Ger em li ser şopa heqîqeta felsefeya Rêberê xwe, hîn bi xurtî û rêxistinî bimeşin û li ber xwe bidin, serkeftin her a me ye, şikestin a neyarên me ye!

www.arsivakurd.org



## Qedexeya plastîkan di sala 2021'î de dest pê dike

**BRUKSEL -** Ji bo pêşî li gelaşên bi milyonan ton plastîk a li okyanûsan were girtin, Yekitiya Ewropayê beriya niha biryar dabû ku gelek berhemên plastîk bên qedexekirin. Tê texmînkirin ku ev qedexe di sala 2021'î de bikeve meriyetê. Nûnerên Komîsyona Yekitiya Ewropa û Parlamenta Ewropayê li Brukselê li hev civiyan û li hev kirin ku 10 berhemên plastîk ên tenê carekê tên bikaranîn werin qedexekirin. Tê gotin, peymana ku di navbera Komîsyona Yekitiya Eropa û Parlamentê Ewropayê de hatiye amadekirin, wê destpêka di sala 2019'yan de bê pejirandin.



# Tirsa Almanyayê ya ji alên kurdan

Tevî ku dadgehên herêmî yên li Almanyayê biryar dan ku ala YPG'ê sûc nîne, dozger lêpirsînên nû vedikin. Herî dawî bang li rojnamevanê Alman Peter Schaber hate kirin ku ji ber piştgiriya ji bo YPG û YPJ 'ê îfadeyê bide. Schaber di ifadeya xwe de got ew ne partiyeke terorîst e

Tirsa dewleta alman a ji alên YPG/YPJ'ê dewam dike. Tevî ku li Almanyayê li dijî hêzên rojavayê Kurdistanê qedexeyeke fermî nîne jî, alên YPG/YPJ û PYD'ê di çarçoveya fermannameya 2'yê kanûna 2017'yan a Wezareta Karên Hundir a Almanyayê de hatibûn qedexekirin.

Bi taybetî li Eyaleta Bavyerayê, bi hinceta ala YPG/YPJ'ê û piştevaniya li Rojava, hêzên ewlekariyê diavêjin ser malên aktîvîstên alman û lêpirsînê li wan vedikin. Aşkera bû ku lêpirsîneke bi heman rengî li rojnamevan Peter Schaber hatiye vekirin.

Schaber yek ji edîtorên kovara Lower Class a çepgir û rojnameya Jûnge Weltê ye. Polîsên şaxê siyasî yê Midûriyeta Emniyetê ya Berlînê ji bo îfadeyê bang li Schaber kir. Schaber bi 'alîkariya ji bo rêxistineke terorê ya biyanî' hate sûcdarkirin.

**' Min destek neda terorê'**

Schaber ku demekê li Sûriye û Rojava ma û tecrûbeyên xwe yên li vir kir pirtûk, anî ziman ku ew li pêşberî lêpirsînê matmayî maye. Schaber diyar kir, wî destek daye têkoşîna li Rojava ya li dijî DAIŞ'ê, piştgirî daye modela civakî, pergala komunal û jiyana wekhev a li Rojava.

Rojnamevanê alman diyar kir, kesên bi aqil tu carî ji YPG û YPJ'ê re nabêjin 'terorîst' û wiha dewam kir: "Du sedemên hewldanên Almanyayê yên li dijî YPG'ê hene. Ya yekemîn; hevkariya bi rejîma Erdogan re, ya duyemîn jî tirsa ji ber nêrînên YPG'ê ye. Ne ji çekên YPG'ê, lê ji fikrên YPG'ê ditirsin. Fikrên YPG'ê ji bo pergala kapîtalîst cihê fikaran e."



**Partiya çep nerazîbûn nîşan da**

Endama Meclisa Federal a Partiya Çep Ûlla Jelpke nerazîbûn nîşanî lêpirsîna li rojnamevan Peter Schaber hatiye vekirin da. Jelpke bi bîr xist, YPG li Almanyayê ne rêxistineke qedexekirî ye, ne jî weke 'rêxistineke terorê' tê binavkirin û der barê lêpirsîna li Schaber hate vekirin de got, 'êrîşa li dijî azadiya çapemeniyê ye'.

Polîsên Berlînê ji ber piştevaniya bi YPG'ê re dosyayeke nû ya lêpirsînê vekir, lê li Eyaleta Saksonyaya Jêrîn dosyaya lêpirsîneke bi heman rengî hate girtin. Meha sibatê ji bo şermezarkirina dagirkeriya dewleta Tirk a li Efrînê, li bajarokê Wendlandê li avahiya dîrokî ya bi navê Gasthof Meûchefîtzê pankarta bi nivîsa 'Hêzên tirk bi çekên alman li Rojava mirovan dikujin, bijî YPG/YPJ' hatibû daliqandin.

Polîsan piştî demekê avêtin ser avahiyê, pankart desteser kirin û dozgeriya Lunebûrgê der barê rêveberê avahiyê aktîvîst Hans Erîch Saûerteîg de biryara lêpirsînê da. Li gorî agahiyan, dozgeriyê duh dosyaya lêpirsînê girtiye û Saûerteîg sûcdar nedîtiye.

Destpêka meha kanûnê jî dadgeheke herêmî ya li Gelsenkîrchenê di doza aktîvîsta alman Monîka Gartner Engel de biryara beraetê dabû. ***BERLÎN***

## Pûîgdemont xwest girtî greva birçîbûnê bi dawî bikin

Serokê berê yê Katalonyayê Carles Pûîgdemont ji çar lîderên serxwebûnxwaz ên li girtîgehê xwest ku dawî li greva xwe ya birçîbûnê bînin ku berî sê hefteyan dest pê kiribû. Serokê berê yê Katalonyayê Carles Pûîgdemont ê li Belçîkayê sirgûnkirî ye, nameyeke ji çalakgerên greva birçîbûnê yên Katalan re nivîsî.

Şêwirmendê berê yê Pûîdemont Jordî Tûrûll û serokê berê yê ANC'ê Jordî Sanchez ku komeleya serxwebûnxwazan e, ji 1'ê kanûnê û vir ve di greva birçîbûnê de ne. Her du rêveber li girtîgeha Lledoners a bi 60 kîlometreyî li bakurê Barcelonayê ye, tên girtin. Wezîrên berê yên herêmî Josep Rûll û Joaqûîm Form jî piştî du rojan tev li greva birçîbûnê bûn.

Çalakger, xemsariya Dadgeha Destûra Bingehîn protesto dikin ku der barê serlêdanên wan de gelekî lawaz tevdigere. Li gorî girtiyan, Dadgeha Destûra Bingehîn hewl dide ku doz bi derengî biçe ber destê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê.

Pûîgdemont û gelek rêveberên berê yên Katalan ji her çar girtiyan xwestin ku dawî li greva birçîbûnê bînin. Dozgerê Dadgeha Bilind a Îspanyayê, destpêka meha mijdarê xwestbû ku ji 7 sal heta 25 salan ceza li 12 ji 18 rêveberên serxwebûnxwaz ên Katalan were birîn. Niha 9 rêveber girtî ne.

Referandûma serxwebûnê ya Katalonyayê, tevî ku rêveberiya navendî qedexe kir, li gel zext û astengiyan jî di 1'ê cotmeha 2017'an de pêk hatibû. Piştî referandumê ku helwesta tund a polîsan derket pêş, 27'ê cotmehê Parlamentoya Katalonyayê serxwebûn îlan kiribû. ***BARCELONA***



## FARC: Tecrîdkirina Ocalan sûc e

Bertekên li dijî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li gelek deverên cîhanê mezintir dibin. Endamên FARC'ê yên jin têkildarî mijarê daxuyaniyek dan û ragihandin ku piştgiriyê didin çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger a ku hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven ji bo rakirina tecrîda girankirî ya li ser Ocalan daye destpêkirin. Di berdewamiyê de jî FARC'ê tecrîda li ser Ocalan weke kiryareke li dijî mirovahiyê û li dijî qanûnan bi nav kir û got ku tecrîda li ser Ocalan sûc e.




**Bal kişand ser girtinan**

FARC'ê destnîşan kir ku girtina Ocalan li pêşiya çareseriya siyasî û aştiyane ya rewşa gelê kurd asteng e û li dijî hemû peymanên navneteweyî ye. FARC'ê daxuyand tevî ku parlamenterên HDP'ê, zêdetirî 5 hezar kesên destekê didin partiyê hatine girtin. FARC'ê ragihand ku ew piştgiriyê didin çalakiya Leyla Guven û xwest Guven di zûtirin dem de bê berdan.

Pîştî têkoşîna 50 salan a FARC'ê ya li Kolombiyayê, demek berê derbasî nava qada sivîl û siyasetê bû û navê 'Hêza Şoreşger a Alternatîf a Gel' li xwe kir. Niha jî xebatên xwe di qada sivîl û siyasetê de dike. ***BRUKSEL***

## Dixwazin hemwelatîbûna tirkiyeyiyan rawestînin

Partiya FPO ya ku hevparê koalîsyona li Awûstûryayê ye, bi hinceta ku Enqereyê di mijara hemwelatîbûnê de hevkarî nekiriye, dixwaze mafê hemwelatîbûnê yê tirkiyeyiyan rawestîne.

Partiya Azadiyê ya Awûstûryayê (FPO) ku partiyeke rastgir a tund e, hevparê herî biçûk ê hikûmetê ye. Lîderê FPO û Alîkarê Serokwezîr Heînz Chrîstîan Strache diyar kir ku ew dixwazin pêşî li hemwelatîbûna tirkiyeyiyan bigirin.

Strache ragihand, di mijara lêkolînkirina hemwelatîbûnê de ku zêdeyî 270 hezar tirkiyeyî lê dijîn, Enqere hevkariyê nake û ev yek jî weke hinceta biryara xwe ragihand.

Li Awûstûryayê mafê tirkiyeyiyan ê ji bo hemwelatîbûnê nîne. Li gorî qanûnên Awûstûryayê, dema ku tirkiyeyiyek bû welatiyê Awûstûryayê, divê ji welatîbûna tirkiyeyê derkeve. Di hilbijartinên derbasbûyî yên Tirkiyeyê de, aşkera bû ku zêdeyî 100 hezar tirkên welatiyên Awûstûryayê deng bi kar anîne. Vê yekê jî rê li ber wê nîqaşê vekir ku tirkiyeyiyên bûne welatiyên Awûstûryayê ji hemwelatîbûna tirkiyeyê derneketine yan na! ***VIYANA***



## Biryara dê Lula pê bihata berdan, hate betalkirin



Biryara dadgeriyê ku wê serokdewletê Brezîlyayê yê berê Lula da Sîlva pê bihata berdan, ji dadgeha bilind vegeriya. Dadgeha bilind biryar dabû girtiyên ku ji dadgehên temyîzê yên welêt ceza standibin û li organên darazê yên bilindtir itîraz kiribin, divê werin berdan. Dadgerê dadgeha bilind Marco Aurolîo de Mello bi vê biryarê rê li ber vedikir ku serokdewletê berê Lula da Sîlva ji girtîgehê were berdan serokê dadgehê Josê Antonîo Dîas Toffolîgor, got biryara dadgerê bilind Mello hatiye betalkirin. Luîz Inacîo Lula da Sîlva ku 2003-2011'an serokdewletî kir, bi sûcdariya ku gendelî kiriye, 12 sal ceza lê hatibû birîn. ***BREZÎLYA***

CAMA CÎHAN

Ramazan OLÇEN
ramazanolcen@hotmail.com



## Proseseke nû dest pê dike

Îro min dil hebû ku ez li ser çalakiya Êlekzeran binivîsim. Roja şemiyê wê cara 6'an dakevin qadan. Polîtîkayên aborî û civakî yên Macron wê cara 6'an ji aliyê fransiyên Êlekzer ve were şermezarkirin. Daxwaza wan Fransayeke adil e. Ew xwe weke civaka hemû Fransayê pênase dikin. Ev yek rast e jî. Ji gelek beş, bîrdozî, siyaset, baweriyan mirov bi êlekên zer nasnameyeke din tevî naveke din li xwe dikin.

Bes geşedanên li Rojhilata Navîn diqewimin vê heftiyê jî kirin ku ez li ser rûdanên dawîn ên li Rojhilat binivîsim. Ji ber ku heta pirsgirêka li Rojhilata Navîn çareser nebe, wê tu pirsgirêkên li parzemîna Rojava jî çareser nebin. Êlekzer bi daxwaza Franseyeke adil dadikevin qadan lê heta li Rojhilata Navîn edalet tesîs nebe li Fransayê jî rewş wê neguhere.

Serokdewletê Amerîkayê Trump der barê vekişîna ji Sûriyeyê de yek du tweet weşandin. Piştre peyamên bi nakok ên rayedarên amerîkî li pey hev hatin dayîn. Helbet ev ne cara yekem e ku Trump behsa vekişîna ji Sûriyeyê dike lê îcar ji bo vekişînê zêde cidî xuya dike.


Tişta ku ez di dawiyê de bibêjim ez hema niha bibêjim; ji ber pozisyon û hevsengiyên li Rojhilata Navîn; Amerîka bi piyên xwe ji herêmê derkeve jî destê xwe ji herêmê venakêşe.

Ez vê yekê jî hema wisa ji ber xwe nabêjim. Ji ber ku di vê demê de a Amerîka dixwaze Îranê bloke bike. Amborgoya li ser wê dişidîne. Der barê Rûsyayê de jî ji Afganistanê bigire heta bi Ûkrayna û helbet Sûriyeyê stretejiyeke ku qelskirina Rûsyayê hedef digire esas digire. Li Iraqê ji ber qayişkêşiya di navbera Amerîka û Îranê de hêj hikûmet nehatiye avakirin. Dîsa faktora parastina Îsraîlê jî heye. Jixwe li vir qet hewce nake ku mirov behsa rejîma tirk a faşîst û kesybaziya wê bike. Dema mirov van daneyan hemûyan datîne berhev, tişta ku jê re tê gotin vekişîn, wê di realîteyê de çawa be ew hêj nediyar e.

Bes di van rojên ku selvegera 9'emîn a raperînên bi navê 'Bihara Erebî' tê naskirin e, wisa xuya ye ku stratejiya bi kûrkirina neçareseriyê parastina hevsengiyê ber bi merheleyeke din ve diberride. Amerîka li aliyekî behsa 'kişandina fîşê Astanayê' dike, li aliyekî dawî li peymana nukleerê ya ku di sala 1970'yan de bi Rûsyayê re girêdabû betal dike. Bi talîbanan re hevdîtinan dike, NATO'ya ereban hewl dide ava bike, ambargoya li ser Îranê dişidîne, asta têkiliya xwe ya bi Tirkiyeyê re daxistiye ser maslahatguzaran.

Di nav vê geremolê de û hewaya bi mij û moran de kîjan hêz bikaribe xwe birêxistin bike wê bi ser keve. Nemaze jî ev prosesa vekişînê li Sûriyeyê wê bandoreke mezin bike. Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê çiqas bikaribe jiyana gel li ser esasen şerê xweparastinê saz bike û çeperên berxwedana enternasyonalîst çiqas bikaribe bi pêş bixe wê ewqas azadiya xwe misoger bike. Bi serketina vê nîzama nû wê li Rojhilata Navîn gelek qesrên zilmê jî hilweşîne.

www.arsivakurd.org



## Beraet kerdbî la qerarê 'teberê sînorkerdişî' dîya

**İZMİR -** Dilbirîn Sadiko ke Kobanî ra tewrê keyeyê xo 7 serrî yo ke qezaya Torbali ya Îzmîrî de cuyeno, dikanêk de o û sewbîna kesêk kewtbî qirika yewbînan û ameybî derbkerdiş. Hedîse ra dima Sadikî şîbî qereqol û kesê ke ci derb kerdî gere kerd. La qereqol de polîsî ewnîyayî telefonê ci û fotografêk vera bi îdîaya 'propagandaya rêxistine' ame sucdarkerdiş. 14. Mehkemaya Cezaya Giran ya Îzmîrî derheqê Sadikî de doz akerde û badê demêk qerarê beraet, daye. La Walîya Îzmîrî 8ê teşrîna peyêne de derheqê Sadikî de qerarê 'teberê sînorkerdişî' dîye.

# Beno ke netîceyê giran bibî

**Sereka TÎHVî Prof Dr. Şebnem Korur Fîncancîye qala rewşa Leyla Guvena ke grevê vêşanîye de ya kerde û va: "Wexto ke merdim vengê xo nêeşko bido eşnawitiş, muracatê raybaza grevê vêşanîye dano. Hîna ke netîceyê giran nêvejîyayo raşte, ganî çîyê lazim yê çalakgeran bêrî bicaardiş."**



Hemsereka Kongreya Komelê Demokratîke (KCD) û Parlamentera Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) ya Colemêrgî Leyla Guvene seba ke tecrîdo ke Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî şermizar bikera, 8ê teşrîna peyêne ra nata grevê vêşanîye de ya û grev roja 45. de dewam kena. Heta nika hîna ti cewabêk nêdîyayo waştişê Leylaye û rewşa aye her keş ona giran bena.

Sereka Weqfa Heqê Merdiman ya Tirkîye (TÎHV) Prof Dr. Şebnem Korur Fincancîye qala rewşa Leyla Guvena ke grevê vêşanîye de ya kerde û dîyar kerde ke hîna ke netîceyê giran nêvejîyayî raşte, ganî çîyê lazim bêrî kerdiş.

**Netîceyê giran estî**

Sereka TÎHVî Prof Dr. Şebnem Korur Fîncancîye grevê vêşanîye yê Leyla Guvene ercnaye û va 'ma sey xebatkaranê weşî heme hetê grevê vêşanîye ser o vindenî' û wina domanye: "Rewşa weşîya merdiman bi hawayo cidî tesîr bena. Qey la B1? Çimkî B1 mezgê merdiman û heme sînîrê bedenê merdiman paweno. Vîşêrê înan sewbîna tesîrê ci yê muhîm zî estî. qet nêbo vernîya seqetîya merdiman padano. Eke B1 nêro xebetnayîş û tena awe, sol, şekir û karbonatî bêrî xebetnayîş do rayîrê kêmasîyanê cidî biabo."

**Goş bidêne waştişanê înan**

Prof Dr. Şebnem Korur Fîncancîye qiseykerdişê xo de bale ante tesîrê ke grevê vêşanîye de beden û weşîya merdiman ser o benî ser û wina dewam kerde "Eke B1 bêro waştiş û nêro dayîş no binpaykerdişê heqan o. Ganî heme lazimîyê kesê ke grevê wêşanîye de yî, bêrî caardiş. Grevê vêşanîye de badê 40 rojan rewşa weşîya merdiman giran bena. Ma ewnîyenê emrê çalakgeran û rewşa weşîya înan. Ma gore her yew cîya cîya muhîm o. Ganî teqez gam bi game bêrî taqîpkerdiş. Ganî rayapêroyî waştişanê çalakgeran pare bikero û heme kes goş bido waştişanê înan."

**Ganî bêrî aşkerakerdiş**

Prof Dr. Şebnem Korur Fîncancîye qiseykerdişê xo de yê peyênan de wina va: "Wexto ke merdim vengê xo nêeşko bido eşnawitiş, muracatê raybaza grevê vêşanîye dano. Hîna ke netîceyê giran nêvejîyayî raşte, ganî çîyê lazim yê çalakgeran bêrî bicaardiş. Ganî waştişê Leylaye bi hawayo lez bêrî bicaardiş û rayapêroyî de bêrî aşkerakerdiş." *STENBOL*



## Tena 15ê ci muracatê MHME kerdî

Komeleya Xebatê Çapemenî û Huqûqî (Media and Lawa Stûdîes Assocîatîon-MLSA), seba piştîdayîşê rojnamegeranê ke yenî tepiştiş, tewqîfkerdiş û taqîpkerdişê doza înan 2017î de ameye awankerdene. Hemdşrektora komeleye Bariş Altintaşe derheê xebatê komele de malumatan daye. Altintaşe dîyar kerde ke hetê huqûqî de 7ê ci tewqîfkerde ê piştî danî bi desan rojnamegeran.

Altintaşe daye zanayene ke ê hem welat û hem zî teberê welatî de dozê rojnamegeran kenî rojeva rayapêroyî kenî û va: "Seba kem a nameyê înan vila bikerî, ma xebetîyenî. Ma seba rojnamegeran û seba pawitişê avûkatanê înan perwerde danî. Tirkîye de bi taybet rojnamegerê kurdî yenî binpaykerdiş û no bi destê muhakeme yeno kerdiş. 9 serrî ceza dîya rojnameger Nedîm Turfentî, la dosyayê ci de ti delîlêk daxî çin o. 20 şahid etî û 19ê ci dîyar kerdî ke binê işkence de îfadeyê înan ameyo girewtiş."

**Hêrişêko topyekun esto**

Altintaşe tewr peynî wina va: "Rewşê winasî de çîyo ke destê ma ra bêro oyo ke ma muracatê Mehkemeya Heqanê Merdiman ya Ewropa (MHME) bikerî. Ma bawer kenî ke do MHMEye de netîce bêro girewtiş û Tirkîye goreyê qerarî têbigêra. Hemverê çapemenî de hêrişêko topyekun esto. OHAL de 300 rojnamegerî erzîyayî zindanan û her çiqan ke qismêk înan serbest bêrî veradayîş zî tena 15ê ci juracatê MHME kerdî. Sebebê oyo ke avûkatê înan çin î û nêeşkenê xo biresnî MHME. Bêedaletîyêko gird esto." *AMED*



## Qayûm çina bo rektorê Unîversîte zî oyo

Serekê Pêroyê yê AKPyî Tayyîp Erdogan weçînayîşê herêmî ra ver Ahmet Çamsari kerd rektorê Unîversîteya Mêrsînî. Derheqê babete de akademîsyen Atilla Guneyo ke bi Qerarnameyê Hukmê Qanûnî (KHK) amebî îxraçkerdiş û Hetgira Doçent Esra Erguzelogluya ke Unîversîteya Mêrsînî ra ameybî îxraçkerdiş qisey kerdîs

Guneyî qiseykerdişê xo de reaksîyon nîşan da û va: "Qayûm çina bo, rektorê Unîversîteya Mêrsînî zî oyo. Dewleta wazena muxalefeto potansîyel yê unîversîteyan bikera bin kontrolê xo. Goreyê polîtîkayan têgêrenî. Rektorî goreyê weçînayîş nê, goreyê tercihan yenî weçînayîş. Bi no hawa tayînkerdişê rektoran yeno mehneya; reîs unîversîteyan seba xo bedilneno ofîsêk û rektor zî nuştoxê taybet yê dîrektorî yî. Verê cû maseyê rektoran ser de fotografê keye û merdimanê înan estbî, la nika yê reîsî esto."

Kîlîme zî qiseykerdişê xo de wina va: "Rektor senî ameyo weçînayîş ma nêzanê. Sîstemê weçînayîşî peynî de mend. Sîstemo bîyaye de rewşa leşkerî çi boy ê unîversîteyan zî oyo." *MÊRSÎN*







## Caardişê kêfî yenî kerdiş

Seke yeno zanayene zindananê Kurdistan û Tirkîye de taybet badê îlankerdişê rewşa OHALî binpaykerdişê heqan zêde bî û tewr zêde zî bi hepsîyanê sîyasîyan teda yena kerdiş. Xeylê dayîkî tewrê domananê xo zindanan de manenî. Endama Komîsyonê Zindanan ya Baroya Wanî Sîmîn Atabaye qala binpaykerdişê heqan yê ke zindana de benî, domanê ke tewrê dayîkê xo zindanan de cuyenî, hepsîyê nêweş û ferzkerdişê SEGBÎSî kerde.

Atabaye arde ziwan ke badê OHALî binpaykerdişê heqan vejîya peymeyêko tewr cor û wina domnaye: "OHAL û KHK sey hacetê meşrûkerdişî yenê xebitnayîş. Bi caardişê kêfî işkence yenê kerdiş. Pêameyîşê Heqê Merdiman ê Ewropa de seba heme kesan heq dîyayo. Heme zindana de şîdet û işkence esto. Sewbîna heme heqê hepsîyan yenî astengkerdiş. Zindanê Trabzon, Patnos, Elezîz û Wanî de binpaykerdişê cidî yenî cuyayîş. Îdareyê zindanan heme binpaykerdişan bin nameyê 'talîmatname' de meşrû kenê." *WAN*


## Hêrîş dewamê serranê 90an o

Hêzê Çekdar yê Tirkîye (TSK) 13ê kanûne de kampa Şehîd Rustem Cûdîyî ya Mexmûrî ke binê pawitişê Neteweyê Yewbîyayeyî (NY) de ya bombardûman kerdbî. Netîceyê bombardûmanî de 7 sivîlî cuya xo vindî kerdbî. Hemverê hêrişî de reaksîyonî dewam kenî û şarê qezaya Geverî ya Colemêrgî zî reaksîyon nîşanê hêrişan da.

Hemsereka Partîya Herêmê Demokratîkî (DBP) ya Geverî Oznur Evîne ard ziwan ke Tirkîye hemverê pêkerdişê mîyanneteweyî û huqûqî de têgêrena û va: "Merdimê ke Mermûrî de cuyenî, merdimê ke serranê 90an de zilmê dewlete ra koç kerdî yî. Kampa Mexmûr hetê NYyî ra ameye awankerdiş. La nika hêrişê cidî estî. Bi hezaran kes tehdîdê qirkerdişî reyde rî bi rî yî. No hêriş dewamê serranê 90an o. Ganî dinya bêveng nêmana."

Gulçîn Karaburk û Ayşen Fendîka ke merdimê aye Mexmûr de cuyenî qisey kerdî û vatî: "Ma çiqas vajê aştîye ê hêrişê ma kenî. Hemverê hêrişan de bêvengbîyayîş wijdanî û merdimî nîyo. Serranê 90an de dewanê ma veng kerdî. Ma bi zorî dewanê ma ra vetî, veşênayî û rijnayî. Ma ser de koçkerdiş ame ferzkerdiş. Nika hêrişî dibare benî. Cuya heme kesan binê tehluke de ya. Eke Barzanî piştî nêdayêne dewleta Tirkîye do wina nêbayane. Wa Barzanî êdî dest rijnayîşê gonîya şarê xo ra vera bido. Wexto ke babete bena kurd heme hêzê mîyanneteweyî ker û lal benî." *COLEMÊRG*





SERADA VÎRÎ
Nesrîn NAVDAR
NesriNavdar@hotmail.com



## Sebebê Nê Teşxelyan Dagirker ê

Bi hezaran serran o ke Şarê Kurdî na axa xo ya qedîme ser de ciwîyêno û wazeno ciwîyayîşê xo aye ser de bi azadî bidomno. Çimê şarê Kurdî ti wextêke axa yewî de nêbîyo û ti wextêke welatê yewî dagir nêkerdo la, çi heyf ke koçeranê Asyaya Mîyanîne ra bigî heta kolonyalîstanê Ewropa û Emerîka înan ra zî bigî heta talankarê ke cîranê Kurdan ê heme milet û dewletanê dinya bi nîyetê xo yo xerab çim kerd welatê Kurdan, welatê înan perçe perçe kerd, heme dewlemendîya erdnîgarîya înan xo rê xebetna û her tim hewl danê ke estbîyayê fizîkî yê şarê Kurdî zî raste ra wedarê.

Sey ke ma zanê bindestverdayîşê şarê Kurdî û dagîrkerdişê welatê înan de dest zehf milet û dewletan esta la, ma eşkenê vacê ke dimayo ke Kurdan hetkarî da cengizxan û ogizxanan û ey welatê xo de hewênayî ra tepya bindestkerdişê înan o tewr zêde û qeîm ke hetê dagirkeran ra heta rocê ma eyroyî domêno dest pê kerd. Helbet dimayo ke Kurdan war û welatê xo de ca da înan û dî ke nîyetê meymananê înan xerab o dest bi têkoşîn û serrewedartişan kerd û serrewedartişê înan zî heta rocê ma yê eyroyî domêno. Tenê ma banîrê rewşê Rocawanî ra bes o ke ma nîyetê xerabî yê nê teber ra amayayan bivînê. Dinya destkewtişanê Kurdanê Rocawanî rê bî şahid ke senîn bê şerr û vinîkerdişan îradeyê axa zo viste destê xo.

La ey nê rê zî bî şahid ke senîn hetê dagirkeran ra çeteyê DAÎŞ'î ameyî birayvistişî, senîn hetkarî înan rê amî dayîşî Kurdanê Rocawanî ser de bi hovî ameyî şirawtişî. Sere de Tirkîye çend dewletan paştî da DAÎŞ û ey Kurdan ser de şirawitî û Kurdan bi xoverdayîşêke tarîxî nê çeteyê înan têk berdî. Dimayê nê destkewtişê şarê Kurdî pergala dagirkere ke hetê AKP'î ra yena rayra berdişî tehemul nêkerd û kewt mîyanê geyrayîşan ke nê destkewtişanê şarê Kurdî ancî înan ra tepya bigîro û bi destkedayîşê Emerîka, Rûsya û çend welatê bînan, bi qiwetêke pîl ê hewayî û bejahî şaristanêke qic ê sey Efrînî dagir kerd. Verê çimanê heme dewletanê ke vanê ma demokrat ê û heqanê bingehînan ê heme şaranê dinya nas kenê û bi qanûn û peymananê xo înan pawenê de şaristanêke şarê Kurdî Rocawan de hetê Tirkiye ra ame dagirkerdişî la ey heme welatan bi bêvengîya xo paştî da dagirkerîya na pergale.

Ma baş zanê eyro roc sebebê teşxeleyanê ke Kurdan ser de virazênê û sebebê teşxeleyo ke Sûrîye û Rocawan de domêno heme Emerîka, Rûsya, Îran, Ewropa û Tirkiye bi xo yê. Xo ra awankarê DAÎŞ'î bi xo zî ey bi xo yê. Nê heme dewletî xoserîya Kurdan ra tersenê û nêwazenê ey biarsê xoserîya xo. Ey zanê xoserîya Kurdan xoserîya heme şaranê Rochilata Mîyanîn a. Roco ke nê heme welatî pertalanê xo bigîrê û Sûrîye û Rocawan ra vecîyê û destê xo Rochilat ser ra wedarê hema pey înan ra go aramî û aştî zî bêro axa şaranê na erdnîgarîya Rochilata Mîyanîne ser. Ma zanê ke hetê eynî qiwetan ra Rayberê Şarê Kurdî zî bi komployêke teslîmê Tirkîye amebi kerdişî û no tecrîdo ke bi serran o domêno zî bi hetkarîya înan domêno.


Eyro şarê ma ancî hetêke grevê veyşanî ke semedê wedartişê tecrîdî kewtê ci domnenê, hetêke zî xebatê weçînayîşî ke semedê qewernayîşê xespkaranê ke ked û îradeyê înan ser de dayo ro domnenê. Sey ke yeno zanayîşî ma bi xebetnayîşê heqê xo yê weçînayîşî ke goreyê Qanûnanê na pergale ra ameyo rûnayîşî îradeyê xo moştib ra la hetê na pergala dagirkere ra îradeyê ma zî ameyo xespkerdişî.

www.arsivakurdi.org

# Di qada hunerê de çend jinên kurd

1

Di her warekî civakî, aborî, zanistî an jî hunerî de yên ku pêngava yekê diavêjin, ew kes in ku di warê rewşenbîrî de hinek pêşdetir difikirin. Ew dibine destpêka şopeke girîng û dîrokî ku bandorê li ser derdora xwe datînin. Hinek kes diçine nav şoreşê û dibine şoreşger, lê hinek kes jî dibine serkêşên şoreşê û reng û rûyê jiyana civakê di warekî sûdmend de diguherînin.



Kakşar
OREMAR

Vê nivîsê pêşkeşî ruha Eyşe Şanê û hemû jinên wek wê dikim. Ji Meryem Xan û Dayikî Cemal heya Banû Şêrwanî, Gulbihar û Eyşe Şanê ji bo biranîna hemû hunermendan

Di dirêjahiya sedan salan de jinên kurd jî di gelek warên siyasî, civakî, aborî û hunerî de mil bi milê mêran xwedî liv û lebateke bêrwasetan bûne. Li jêr ez tenê bi kurtî behsa jiyan, wêrekî û xebata çend jinên hunermend li Kurdistana mezin dikim ku heya roja îro jî ji nifşên pey xwe re bûne xwendingehên hunerî. Yên ku pêngava yêkê avêtin û ji sedan keç û jinên din re bûne mînak xwedî jiyaneke kurt, tije bextreşî, bi êş û derbederî, lê navê wan dê tim di dîroka hunera Kurdistanê de bi qedirnasiyek bêhempa bimîne.



***Evîndara stran, dengê qedîfe û derbedera hunera kurdî: Meryem Xan (1904 Dêrgol-1949 Bexda)***



Meryem Xan keça Ehmedê Botî ye. Ew di sala 1904'an da li gundê Dêrgolê hatiye dinê.

Meryem Xanê perwerdeya xwe ya hunerî di germiyan, zozan, şahî û şêniyên Botanê de, di nav gelê xwedî çandek dewlemend de girt.

Destpêka jiyana Meryem Xanê vedigere wan salên ku rewşa cîhanê bi giştî û ya Kurdistanê jî bi taybetî ber bi xirabûnê ve diçû. Dema Meryem Xan dikeve deh saliya xwe şerê cîhanê yê yekemîn dest pê dike. Împaratoriya Osmanî ber bi belav bûnê ve diçe û fermena kuştina cîranên kevnar û dîrokî yên kurdan (gelê ermenî) dest pê kiriye. Gelê kurd jî ji bo bi destanîna mafê xwe û damezrandina Kurdistanek serbixwe hêdî hêdî dest bi serhildanan kiriye. Ev rûdavên wiha dibin sedem ku gelek kurd ji bakurê Kurdistanê koçberî başûrê Kurdistanê bibin. Malbata Meryem Xanê jî ji bo debara jiyana xwe cara yekê diçe Qamîşloyê û piştre jî ber bi Zaxo, Musil û Bexdayê koç dike.

Li Qamîşloyê Meryem Xan bi xortekî malbata Bedirxaniyên navdar re dezewice.

Lê mixabin jiyana Meryem Xanê û xortê Bedirxanî zêde dewam nake.

Di sala 1939'an de li Bexdayê radyoya kurdî li ser daxwaz dewleta Îngilistanê hat damezrandin. Li wir kompanyayên tomarkirina stranan hatibûn damezirandin. Hinek kes dibêjin ku Meryem Xanê ji sala 1935'an û pê de heya sala 1947'an tim di radyoya kurdî de xebat kiriye û di vê navberê de jî stranên xwe li ser qewanan tomar kirine.

Dema li bajarê Bexdayê radyoya kurdî hat damezrandin, parek ji mamostayên dengnas û hunerzan hat damezirandin. Di bin çavdêriya vê komîteyê de hunermendên ku dixwestin bibin xwedî mûçe, stran digotin û li ser biryar û dîtina wan bersiva pejirandin an jî ne pejirandinê didan wan. Wek tê gotin heya despêka sala 1940'an û pê de bi rengekî fermî stranbêj li radyoya kurdî nebûbûn xwedî mûçe. Li ser gotina gelek kesan di sala 1944'an de Meryem Xan, Seîd Axayê Cizîrî, Hesen Cizîrî, Elmas Xan, Resûl Gerdî, û gelekên din li dora hev kom bûn û li jêr çavdêriya mamostayên dengnas û bisporên çalakîyên hunerî yek bi yek ketin ezmûna deng û stran xwendinê. Dema di vê civatê de Meryem Xanê dest bi strandinê kir hem hunermendên amade û hem jî mamostayên çavdêr jî desthilatdariyê, xweşiya deng, şêwe û awaza wê hunermenda kurd ecêb dîtî man. Di wê civatê de ji bilî hunermendê nemir Seîd Axayê Cizîrî tu kesî nekarî bi Meryem Xanê re bikeve lecê.

Meryem Xan heya dawiya jiyana xwe karmenda radyoya kurdî bûye û her rojê hatiye radyoyê û li wir xebitiye. Meryem Xan di hemû Kurdistanê de yekem jina kurd e ku li zaravaya kurmanciya jorîn bi rengekî rêkûpêk stran tomar kirine. Dema mirov li deng û stranên wê guhdar dike dengekî resen, kurdî û jinane li ser e. Hêzek mezin û bilind di stirînê de heye, qirika wê paqij û di edakirina peyv û ristên stranên xwe de zimanekî ter, rewan û bedew heye. Ji her tiştî xweştir ew hemû xem û hesretin ku di deng û berhemên wê de tên dîtin.

Stranên hunermenda navdar a kurd Meryem Xanê bi giştî lawik û beste ne. Naveroka wan folklorî ye, lê stranên ku ji xwe re hilbijartine bi piranî li ser mêranî û nepejirandina neheqiyan hatine hildan.

Li ser mirina Meryem Xanê du gotin hene: Hinek jêder dibêjin ku Meryem Xanê ji sala 1945'an pê de ji êşa gulçîskên xwe pir derd kişandiye û du sal (sala1947'an) piştî wê li nexweşxaneya bajarê Musilê wefat kiriye û li goristana Şêx Meirof li bajarê Bexdayê hatiye veşartin. Hinek jêder jî dibêjin piştî ku Meryem Xan ji malbta xwe dûr ket û ji malxê (mêrê) xwe cuda bû, di jiyana xwe de ket nava bêdengiyek xemgîn û di sala 1949'an de bi nexweşiya xembariyê li bajarê Bexdayê çû ber dilovaniya Xwedê.

***Dengê folkolra Soranî: Dayikî Cemal (1908 Helebçe -1979 Bexda)***




Dayikî Cemal yekemîn jina kurd e ku bi zaravayê soranî stran li ser sêlkan (qewana) tomar kirine. Navê wê yê rastîn Ferhe an jî Behîce Îbrahim Yaqûb e. Ji ber ku di ciwaniya xwe de keçeke bedew bûye bi navê Dayikî Cemal di nav xelkê da navdar bûye. Dayikî Cemal ji ber adet û orfên civaka paşverû zû strangotin terikand û heya mirinê xwe wenda kir da ku kes wê mîna hunermend nas neke. Ew jineke xêrxwaz, nefs bilind û gelek mêhreban bû. Qedir û qîmeta wê di nav xelkê da pir bû. Hinek stranên Dayikî Cemal li arşîva radyoya Bexdayê mane, lê ji ber derbasbûna salên dûr û dirêj kuvalîta wan zêde baş nîne. Stranên Dayikî Cemal yên naskirî wihanê: Amînê Amîn, Ay bênin bênin, Hey Belar Belar, Xanimî Silêmanî, Hey Axa w Axa.

Hunermend Dayikî Cemal li sala 1979'an li nexweşxaneya Medînet Eltib li bajarê Bexda çû rehmetê û termê wê li goristana Şêx Meirûf hat veşartin.

***Dengê strana kurdî ya nazik û keça radyoya kurdî: Nesrîn Şêrwan (1928 Şirnex - 10 Cotmeh 1990 Bexda)***

Yek ji wan jinên ku ji bo xizmeta hunera kurdî di rêza yekê de li hemberî çewtiyên civata feodalîzmê sekinî û li ber xwe da, Nesrîn Şêrwan e. Navê wê yê rastîn Xoxê Omer Osman e û di sala 1928'an li Şirnexê hatiye dinê.



Ew ji malbatekê ye ku rewşa jiyana wan berê pir baş bû, lê piştî destpêkirina serhildanên li bakurê Kurdistanê û guherandinên ramyarî-civakî rewşa jiyana malbata wê jî telihev bû. Ji bona wê jî bavê wê nemir Omer Osman neçar ma ku di sala 1932'an weke hezaran malbatên din berê xwe bide başûrê Kurdistanê. Di sala 1933'an de Omerê bavê Nesrînê ji bo ku nanê zikê zarokên xwe peyda bike, hemû zarokên xwe şandin bajarê Zaxoyê. Li wir Nesrîn bi bira û xweşkên xwe re di nav malên dewlemendan de dixebitîn. Nesrînê rojekê di dewatekê de bi dengê xwe yê bilind û xweş ser çopiya dewatê girtibû û distirî. Ew rewşa şahî û dewatê bû. Di wê dewatê de Mamosta Elî Merdan ku wê demê li radyoya Bexdayê dixebitî û berpirsyarekî radyoyê bû, bi bihîstina dengê wê pir bi bandor bû û ji wê xwest ku biçe radyoyê û li wir di komeke muzîkê de bixebite. Nesrîn Şêrwanê li radyoyê bi karê koroyê dest bi xebata xwe ya hunerî kir. Di sala 1944'an de bi rengekî fermî bû karmenda radyoya kurdî û heya dawiya jiyana xwe mîna keça radyoyê, xwe ji vê saziya kurdan dûr nexist.


Nesrîn Şêrwanê piraniya lawik û meqamên xwe bi awayê (Beyat-Husênî) gotine. Piraniya stranên Nesrîn Şêrwan folklorî û gelêrî ne û wê gelek ji stranên cimaeta kurdan bi dengê xwe ji tunekirinê parastin. Naveroka stranên Nesrîn Şêrwanê bi piranî wesfî ne û bi taybetî bedewiya çiya, zozan, gund û siryuşta Kurdistanê bi zimanekî xweş tîne ziman. Stranên mîna Gulşênî, Were Narîn, Hey Nêrgiz - Nêrgiz, Koçerê, Şêxê dînê, Çiyayê me bilind in, Hay berde berde, Heseniko, Hey can, Nêrî, Ez nayêm, Derdê dilan, Hesen Hesen e lo lawo, Narê û bi dehan ji stranên wê di nav gel de belav bûn û bi dengê wê ji tunekirinê hatin parastin. Nesrîn Şêrwan yekemîn jina kurd e ku zêdetir ji hemû jinên stranbêj yanî 500 stran li radyoya kurdî tomar kirine.

Piştî 50 salan xebat û karkirinê di radyoya kurdî de mixabin Nesrîn Şêrwan jî mîna gelek ji stranbêjên din yên kurd di salên dawiya jiyana xwe de gelek feqîr û hejar bibû. Hunermenda nemir Nesrîn Şêrwan di 10'ê cotmeha 1990'an li bajarê Bexdayê çû rehmetê û bi merasimekê ku gelek hunermend û xebatkarên radyoya kurdî têde beşdar bûn, li goristana Şêx Merûf hat veşartin.

***Dengê nûbêjî û folklora kurdî li Behdînan: Gulbihar (1932 Amêdiyê – 23.02.2010 Bexda)***

Gulbihar di sala 1932'an de li gundê Koçanisê yê girêdayî bajarê Colemêrgê li bakurê Kurdistanê hat dinê. Ew bi esila xwe ji herêma Behdînan li bajarê Amêdiyê ne.

'Fatma Mihemed' an jî bi nasnavê xwe yê hunerî 'Gulbihar' keçeke ji bajarê Amêdiyê bû ku di qada hunera kurdî de dest bi nûjenkariyê kir. Gulbihar bi şêwazek nû û muzîkek nûjentir ket ser vê rêya dijwar. Rêya ku ew her tim bi 'Jiyana xwelîserî û tejî êş û elem' bi nav dike. Vê xanima hunermend ji sala 1949'an bi mezintirîn hunermendên ereb re bi karê şanoyê dest bi xebata xwe ya hunerî kir.



Piştî karê şanoyê ket nav cîhana sînemayê û di sê fîlmên erebî de rola yekê û yê du dilîst. Filên Wirde (Gula Sor), Eros Elfirat (Bûka Firatê) û filmeke din a bi navê Lilşeib (Ji Bo Gel) ku qet deatûra êkranê negirt û nehat weşandin. Stranên Gulbiharê ku nêzî 300 hebin, xwedî peyamake civakî ne ku tev şîret in, şîretên daykane ji zarokan re, şiyarbûna dê û bavan li ser torekirina zarokan, bedewiya siruşta Kurdistanê û carna jî berhemên folklorî ku bi dengê wê û hunermendên mêr hatine tomarkirin.

Salên dawiya jiyana xwe li bajarê Duhokê jiya û bi hezar hêviyan li benda wê rojê bû ku keçên kurd zêdetir bikevin ser rêya wan û kesên dengxweş dengê xwe veneşêrin. Ew piştre ji ber ku êdî kesî xwedîtî lê nekir neçar ma çû cem hinek kesên xwe yên nêz li bajarê Bexdayê. Salên dawiyê gelek zehmetî kişandin û dema mir jî wesiyet kiribû ku wê bibin û li goristana bajarê Necefê veşêrin. Mixabin ku bêdeng û bêkes çû û çi merasimek li pey wefata wê jê re nehate kirin…

(didome)